# Bultena heftane

# 3/6/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

Nûçeyên ji cîhanê

## Di Lîga Futbola Jinan de Katalanan qezenc kir

Di Fînala Lîga Şampiyonan a Futbolê ya Jinan de Barcelonayê bi 2-0 ji paş ve hat û bi 3-2 Wolfsburgê têk bir.

https://jinhaagency1.com/ku/werzis/di-liga-futbola-jinan-de-katalanan-qezenc-kir-39290

Çavkanî:JINHA



## Li Belçîkayê jinên karê înşaetê dikin zêde bûne

Li Belçîkayê, di nava pênc salan de rêjeya jinên karê înşaetê û tesîsatê dikin ji sedî 23,6 zêde bû.

https://anfkurdi.com/jin/li-belcikaye-jinen-kare-insaete-dikin-zede-bune-170544

Çavkanî:ANF



## Festîvala Jinê ya Zîlan a 17'emîn wê li Gelsenkîrchenê bê lidarxistin

Festîvala Jinê ya Zîlan ku mezintirîn kombûna jinên Kurd ên li Elmanyayê ye, îsal wê di 17'ê Hezîranê de bê lidarxistin.

https://anfkurdi.com/jin/festivala-jine-ya-zilan-a-17-emin-we-li-gelsenkirchene-be-lidarxistin-170553

Çavkanî:JINHA




## Jinên Nîjeryayê di têkoşîna li dijî bermahiyên plastîk de li pêş in

Li Nîjeryayê jinên xizan, berhamiyên plastîk ên ku avêtine nava xwezayê kom dikin û hawirdorê diparêzin, di heman demê de ji bo veguherandinê difiroşin û dahatekê bi dest dixin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-nijeryaye-di-tekosina-li-diji-bermahiyen-plastik-de-li-pes-in-39352

Çavkanî:JINHA



## Aktîvîsta Jîngehê: Tundiya li dijî jinan çima sivik tê dîtin?

Li seranserê cîhanê her sal zêdetirî 200 çalakvanên jîngehê tên qetilkirin. Li gorî lêkolînê; tundiya li ser bingeha zayendî ya civakî ya li dijî aktîvîstên jin ên jîngehê jî gelek caran ji nedîtî ve tê.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/aktivista-jingehe-tundiya-li-diji-jinan-cima-sivik-te-ditin-39349

Çavkanî:JINHA




## Di Meclisa Neteweyî ya Kuweytê de parlamenterek jin hat hilbijartin

Ji bo Meclisa Neteweyî ya Kuweytê, tenê parlamenterek jin hat hilbijartin. Janan Muhsen Remezan piştî têkoşîna demdirêj a salan bû yekem namzeda jin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/di-meclisa-neteweyi-ya-kuweyte-de-parlamenterek-jin-hat-hilbijartin-39371

Çavkanî:JINHA



## Jina ku rastî tundiya çawişê pispor ê berê hat, bi giranî birîndar bû!

Ayşe Ortmen a ku çawuşê pispor ê berê Faruk Ortmen tundîtûjiya sîstematîk lê dikir di 5’ê Gulanê de li mala ku lê dima de bi awayek giran birîndar bûye hate dîtin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jina-ku-rasti-tundiya-cawise-pispor-e-bere-hat-bi-girani-birindar-bu-39366

Çavkanî:JINHA




## Qeyrana xurekê li ber deriye: Em encamên tercihênên polîtîk dijîn

Qeyrana avhewayê ya ku pisporan bi salane behsa wê dikin her ku diçe kûrtir dibe, bi zêdebûna germahiyê re qeyrana xurekê jî li ber derî disekine. Ekolojîst Pelîn Cengî balkişand vê pêvajoya ku xurek di nirxa zêr de ye, li welat bêpolîtîkatiyek cidî heye.

https://jinhaagency1.com/ku/ekoloji/qeyrana-xureke-li-ber-deriye-em-encamen-tercihenen-politik-dijin-39388

Çavkanî:JINHA



# Li Başûrê Kurdistanê tundiya mêr!

Li Başûrê Kurdistanê di meha Gulanê de 3 zarok û jinek hatin qetilkirin, jinek û zarokek jî bi guman jiyana xwe ji dest dan. Zarokek bi çekê birîndar bû.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-basure-kurdistane-tundiya-mer-39270

Çavkanî:JINHA




# 'Ji bo guhertina civakî divê em nasnameya xwe ji nû ve bi dest bixin'

Seroka Navenda Mafên Jinan û Hiqûqê ya Misirê Nîha Ebû El-Qumsan, bal kişand ser pirsgirêkên jinan û got, "Divê em nasnameya xwe ji nû ve bi dest bixin û fikrên xwe yên resen ji nû ve hilberînin."

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/ji-bo-guhertina-civaki-dive-em-nasnameya-xwe-ji-nu-ve-bi-dest-bixin-39273

Çavkanî:JINHA



## Li Tirkiyê di meha Gulanê de 40 jin hatin qetilkirin

Li gora rapora KCDP, di meha Gulanê de 40 jin ji aliyê mêran ve hatin qetilkirin, 22 mirinên jinan weke bi guman kete qeydan.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-tirkiye-di-meha-gulane-de-40-jin-hatin-qetilkirin-39276

Çavkanî:JINHA




## Bi gotina stranan enerjiya xwe der dikin û jiyan xweştir dibe

Jinên ku li mekanê Weqfa Pêşxistina Hunerê ya Marakeşê tên bi hav, ji aliyekî ve bi stranên ku dibêjin, enerjiya xwe ya pozîtîf zêde dikin ji aliyekî ve jî behsa fikir û tecrubeyên xwe ji hev re dikin.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/bi-gotina-stranan-enerjiya-xwe-der-dikin-u-jiyan-xwestir-dibe-39278

Çavkanî:JINHA



# [Ji France 24’ê Leela Jacinto: Berdêla hevkariya HUDA PAR’ê Jin didin]

Ji malpera nûçeyan a France 24'ê Leela Jacinto, di analîza xwe ya têkildarî tifaqa Serokê Giştî yê AKP'ê Tayyîp Erdogan a bi HUDA PAR’ê re de, nivîsand ku jin ditirsîn berdêla vê hevkariyê bidin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-france-24-e-leela-jacinto-berdela-hevkariya-huda-par-e-jin-didin-39279

Çavkanî:JINHA



# [Derbarê 12 polîsan de ji ber 'ihmala' di qetilkirina jinan de doz hat vekirin]

Hulya Şellavcî Yegen ji aliyê mêrê pêre di pêvajoya hevberdanê de Kaffar Yegin ve hate qetilkirin. Di mirina jina ku biryara parastinê girtî de bi hêceta ku ihmal heye der barê 12 polîsan de îdaename hate amadekirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/der-bare-12-polisan-ji-ber-ihmale-qetilkirina-jinan-doz-hate-vekirin-39283

Çavkanî:JINHA



# TJA: Em ê rê nêdin bi aqilê mêr êrîşî jinan bikin

TJA diyar kir ku di serî de hevseroka giştî ya HDP'ê Pervîn Buldan ew ê rê nedin bi aqil û zimanê mêr êrişî jinan bikin û got: "Em bang li hemû jinan dikin ku têkoşîna azadiyê bilind bikin."

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/tja-em-e-re-nedin-bi-aqle-mer-erisi-jinan-bikin-39300

Çavkanî:JINHA



# Li Iraqê jin di jiyana kar de rastî cihêkariyê tên

Li Iraqê li cihên kar jin rastî nêzîkatiyên nebaş û cihêkariyê tên. Tevî ku peymana navneteweyî ya di vî warî de hatiye îmzekirin heye jî nayê pêkanîn.

https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/li-iraqe-jin-di-jiyana-kar-de-rasti-cihekariye-ten-39297

Çavkanî:JINHA



## Bi berhemên destên Nîgar mirov diçe demên berê

Nîgar Abdullah hewl dide bi riya berhemên destan çanda Kurdî zindî bihêle û biparêze.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/bi-berhemen-desten-nigar-mirov-dice-demen-bere-39292

Çavkanî:JINHA



## Yasmîn Al-Daya bi wêneyên xwe balê dikşîne pirsgirêkên jinan

Yasmîn Al-Daya ya ji Filistinê ku wênexêziyê dike, balê dikşîne ser pirsgirêkên jinan û astengiyên ku ew pê re rû bi rû dimînin.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/yasmin-al-daya-bi-weneyen-xwe-bale-diksine-pirsgireken-jinan-39304

Çavkanî:JINHA



# [Însiyatîfa Jin a li Qahîreyê li dijî cihêkariyê têdikoşe](https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/Insiyatifa-jin-a-li-qahireye-li-diji-cihekariye-tedikose-39306)

Koordînatora Însyatîfa Jin Sarah Kahla bal kişand ser pirsgirêk û cihêkariya ku jinên li gundan dijîn pê re rû bi rû dimînin û teqez kir ku ew ji bo guhertina rewşa jinên li gundan kar dikin û li dijî cihêkariyê têdikoşin.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/Insiyatifa-jin-a-li-qahireye-li-diji-cihekariye-tedikose-39306

Çavkanî:JINHA



# [Li Îranê xwendekara ku ji polîstiyê îstifa kiribû mirî hat dîtin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-xwendekara-jin-a-ku-ji-polistiye-istifa-kiribu-miri-hat-ditin-39309)

Mensûre Segwend a ku mehek berê ji bo piştgiriya serhildanên “Jin Jiyan Azadî” yên li Îranê dest ji polîstiyê berdabû, piştî parvekirina “dibêjin qey em sax in bi guştinê gefan li me dixwin” bi saetan mirî hat dîtin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-xwendekara-jin-a-ku-ji-polistiye-istifa-kiribu-miri-hat-ditin-39309

Çavkanî:JINHA



## Piştî Îranê li Afganîstanê jî li dibistanan jehrîbûn çêbû

Li Afganîstanê 3 dibistanan zarokên keç jehrî ketin. Berdevkê Emniyeta Saraypolê Den Muhammed Nazari got, "Li navçeya Sançarakê hin kesên nasnameya wan nediyar ketin dibistana keçan û sefan jehrî kirin."

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/pisti-Irane-li-afganistane-ji-li-dibistanan-jehribun-cebu-39311

Çavkanî:JINHA



## Bi hinceta hicabê çûyîna ezmûna ajokariyê hat astengkirin

Jinên ku dixwestin li bajarên Îran û Rojhilatê Kurdistanê têkevin ezmûnên ajokariyê, bi hinceta ku li gor quralên cil û bergan tevnegeriyane, demeke dirêj destûr nehat dayîn ku beşdarî îmtîhanê bibin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/bi-hinceta-hicabe-cuyina-ezmuna-ajokariye-hat-astengkirin-39313

Çavkanî:JINHA




## Kirêya zêde ya firoşgehan ji bo jinên bûye astengî

Di gelek warên jiyanê de ruxmê astengiyên li hemberî xwe, jin hewldanên xwe berdewam dikin û li ser lingên xwe radiwestin. Tunebûna cihekî ji bo nasandina berheman û kiriya zêde ya firoşgehan ji bo xebata jinan astengiyan çêdikin.

https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/kireya-zede-ya-firosgehan-ji-bo-jinen-buye-astengi-39315

Çavkanî:JINHA



## Dû jinên çalakvan ên Îranê Îşkenceya ku li girtîgehê dîtin anîn ziman

Li Îranê dû girtiyên kevin ên siyasî Fariba Feridouni û Rezwane Ahmadkhanbeigi diyarkirin ku ji aliyê memûrên girtîgehê ve rastî îşkence û nêzîkatiyên xirab hetine û da zanîn ku li ber kamareyê lêgerîna tazî lê hatine ferz kirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/du-jinen-calakvan-en-Irane-Iskenceya-ku-li-girtigehe-ditin-anin-ziman-39318

Çavkanî:JINHA



# Di meha gulanê de 39 jin hatin qetilkirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li gorî daneyên ajansa me di meha gulanê de 39 jin ji hêla mêran ve hatin qetilkirin û her wiha mirina 23 jinan jî bi guman e.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/212344

Çavkanî:JINNEWS




# Jinên li Mexribê bi projeya ku bi pêş xistine ava qirêj paqij dikin

Li Mexribê 5 jinên ku kooperatîfa "Algler a Biaqîl" ava kirin, ji bo kêmbûna xeleya avê dest bi paqijkirina ava bermahî kirin. Projeya ku li welat taybetmendiya yekembûnê digre, hêjayî xelatê hat dîtin.

https://jinhaagency1.com/ku/ekoloji/jinen-li-mexribe-bi-projeya-ku-bi-pes-xistine-ava-qirej-paqij-dikin-39336

Çavkanî:JINHA



# [Li Xezayê pêşangeha berhemên jinan hat vekirin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-xezaye-pesangeha-berhemen-jinan-hat-vekirin-39330)

Ji bo piştgirîkirina jinên Xezayê, wek aborî bihêzkirina wan a di her warî de û ji bo hêsankirina beşdarbûna wan bazarên cihî pêşangeha bi navê "Berhemên me yên Jinan" hat vekirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-xezaye-pesangeha-berhemen-jinan-hat-vekirin-39330

Çavkanî:JINHA




# [Çeteleya tundiyê ya meha Gulanê ya JINNEWS'ê: 39 jin hatin qetilkirin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/Ceteleya-tundiye-ya-meha-gulane-ya-jinnews-e-39-jin-hatin-qetilkirin-39324)

Li gorî çeteleya tundiyê ya meha Gulanê ya JINNEWS'ê amade kir, 39 jin ji aliyê mêran ve hatine qetilkirin, 23 bûyerên mirina bi guman qewimîn.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/Ceteleya-tundiye-ya-meha-gulane-ya-jinnews-e-39-jin-hatin-qetilkirin-39324

Çavkanî:JINHA



## [‘Divê kesên ku xwezayê qirêj dikin werin cezakirin’](https://jinhaagency1.com/ku/ekoloji/dive-kesen-ku-xwezaye-qirej-dikin-werin-cezakirin-39323)

Xwezaya nîvê cîhanê qirêj bûye, bi taybet li welatên ku hişyarXwezaya nîvê cîhanê qirêj bûyeiya kesan tune ye, zagonên taybet ên ji bo parastina xwezayê bi cih naynin. Ev yek jî dibe sedem ku xweza roj bi roj qirêjtir bibe û çavkaniyên jiyanê tune bibin.

https://jinhaagency1.com/ku/ekoloji/dive-kesen-ku-xwezaye-qirej-dikin-werin-cezakirin-39323

Çavkanî:JINHA



## [Doza Kobanê: Bi mezinkirina têkoşîna jinê dê bersiv bê dayîn](http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/212421)

ENQERE - Di Doza Kobanê de siyasetmedar Ayla Akat Ata diyar kir ku dosyayên darizandinê veguheriye dosyayên tolhildanê. Siyasetmedar Aynûr Aşan jî bal kişand ser hilbijartinê û gotinên li hemberî jinan û got: "Bi mezinkirina têkoşîna jinê dê bersiv bê dayîn."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/212421

Çavkanî:JINNEWS



# Di Foruma Ereb de ‘Wekheviya Ewlehiya Xurekê’ hat nîqaşkirin

Li Beyrûdê jinên ku beşdarî Foruma Ereb a Duyemîn ya bi sernavê “Dengek, wekheviya di ewlehiya xurekê” de bûn, bal kişandin ku bi taybetî jinên kêm dikarin xurekê bi dest bixin di ben xetera xurekê de ne.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/di-foruma-ereb-de-li-ser-wekheviya-ewlehiya-xureke-niqas-hat-kirin-39356

Çavkanî:JINHA




# Jin bi bertek in: Sûcdar tên parastin rojnameger tên sînordarkirin

Rojnameger û çalakvanên Lubnanê teqez kirin ku li şûna kiryarên êrîşa li dijî jinan bên cezakirin û azadiya nêrîn û derbirandinê bê parastin, kiryar bê ceza dimînin û rojnameger tên sînordarkirin.

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/rojnameger-bi-bertek-in-sucdar-ten-parastin-rojnameger-ten-sinordarkirin-39342

Çavkanî:JINHA



## ‘Ger em nexebitin em ê birçî bimînin’

Sultan Sena ya ku tevî temenê xwe yê mezin ji ber lêçûna jiyanê ya zêde ji bo debara xwe bike li bazarê dixebite, bi van gotinan bertek nîşanî rewşa heyî da: “Erdogan bihayê her tiştî zêdetir kir. Ev hê rojên me yên xweş in.”

https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/ger-em-nexebitin-em-e-birci-biminin-39340

Çavkanî:JINHA




## Li Eskîşehîrê tundiya mêr

ESKÎŞEHÎR- Li navçeya Odunpazari ya Eskîşehîrê  mêrekî tundî li jinekê kir.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/212510

Çavkanî:JINNEWS



## '94 jin hatin kuştin, mirina 84 jinan jî bi guman e'

AMED - Navenda Lêkolînên Qada Civakî-Siyasî diyar kir ku, tundiya li ser jinê zêde bûye û ragihand ku di navbera 1'ê adarê û 31'ê gulanê de herî kêm 94 jin hatine qetilkirin û 84 jin jî bi guman mirine.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/212500

Çavkanî:JINNEWS




## Rojnamegerên jin ên Tûnisê di bin zexta darazê de ne

Rojnamegerên jin ên li Tûnisê ji bo peywira xwe bi awayê azad bi cih bînin, li dijî hemû şêweyên tundiyê li ber xwe didin. Gelek ji wan dema ku peywira xwe dikin rastî gefan tên, lêpirsîn li wan tên vekirin û tên darizandin.

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/rojnamegeren-jin-en-tunise-di-bin-zexta-daraza-mer-de-ne-39364

Çavkanî:JINHA



## ‘Wê berê jinan li kolanan be’

ENQERE - Piştî hibijartinan têkoşîna rêxistinkirî ya jinan a li dijî tabloya sedest bû yek ji rojevên jinan. Endamên Partiya Meclîsa HDP'ê û Meclîsa Jinan a HDP'ê diyar kirin ku wê pêvajoya pêş de ligel têkoşîna qanûnî û li parlamentoyê wê berê xwe bidin kolanan.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/212533

Çavkanî:JINNEWS




## Sercerdevan hewl da jinekê bikuje

Sercerdevan Selahattîn Umay hewl da jina ku pê re zewicî bû bikuje. Zarokê 13 salî ji bo diya xwe biparêze Umay birîndar kir.

https://anfkurdi.com/jin/sercerdevan-hewl-da-jina-ku-pe-re-zewici-bu-bikuje-170655

Çavkanî:ANF



## Lîstikvana Tûnisî Amina Dachraoui pirsgirêkên jinan tîne ser dike

Lîstikvana şanoyê û derhêner Amîna Dachraouî ku pirsgirêkên jinên Tûnisî tîne ser dikê, anî ziman ku ji ber zîhniyeta serdest a mêr hê jî zehmetiyan dikşîne.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/listikvana-tunisi-amina-dachraoui-pirsgireken-jinan-tine-ser-dike-39386

Çavkanî:JINHA



**Nûçeyên herêmî**

## [Edîtora Afaq Al-Meraa: Pêwîstiya pêvajoyê bi pênûsa jinan heye](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/editora-afaq-al-meraa-pewistiya-pevajoye-bi-penusa-jinan-heye-39271)

Edîtora Kovara Afaq Al-Meraa Nêrgiz Ismaîl der barê armancê derxistina Kovara Afaq Al-Meraa de axivî û wiha got: “Armanca kovara me vegotina zanista jin û bi asta wê ya bîrdozî, polîtîk û çandî xwepênasekirina jinê ye.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/editora-afaq-al-meraa-pewistiya-pevajoye-bi-penusa-jinan-heye-39271

Çavkanî:JINHA




## [Şervanên enternasyonal qala Rojava kirin: Me cewhera xwe nas kir](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/Servanen-enternasyonal-qala-rojava-kirin-me-cewhera-xwe-nas-kir-39286)

8 jinên enternasyonalîst ên ku bi têkoşîn û îsrara xwe bûn parçeyek ji Şoreşa Jinê ya Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê û di qadên wê yên cuda de cih girtine, çîrok û tecrubeya xwe ya dewlemend anîn ziman.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/Servanen-enternasyonal-qala-rojava-kirin-me-cewhera-xwe-nas-kir-39286

Çavkanî:JINHA



## Jinên Dêrezorê bi çêkirina kerpîçên ji axê debara xwe dikin

Gelê gund û bajarokên Dêrazorê ji ber bihabûna malzemeyên înşaetê, jinan bi kerpîçên axê dest bi çêkirina malan kirine û derfetên kar ji bo jinan ava kiriye. Jin bi kerpîçên ji axê çêdikin û debara xwe ya aborî pê dikin.

https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/jinen-derezore-bi-cekirina-kerpicen-ji-axe-debara-xwe-dikin-39295

Çavkanî:JINHA



## Li Efrîna dagirkirî jineke 70 salî hat qetilkirin

Li taxa Maratê ya Efrîna dagirkirî pirejinek bi guleyên çeteyan hate qetilkirin.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/li-efrna-dagirkir-jineke-70-sal-hat-qetilkirin-h75053.html

Çavkanî:ANHA



## Li Îdliba ku dibin kontrola HTŞ de karkirina parêzerên jin tê astengkirin

Îdliba ku beşek ya wê dibin dagirkeriya çeteyên HTŞ de, jinên parêzer ên kuÎdliba ku beşek ya wê dibin dagirkeriya çeteyên HTŞ de, jinên parêzer ên ku şopandina wan ya dozê tê şopandina wan ya dozê tên astengkirin, gihane xala dest ji pîşeyên xwe berdin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Idliba-ku-dibin-kontrola-htS-de-karkirina-parezeren-jin-te-astengkirin-39326

Çavkanî:JINHA




## Rêxistina Sara doza qetilkirina 3 jinan dişopîne

Arzû Temo diyar kir ku Rêxistina Sara dozên qetilkirina Ala, Nûa û Zubeyda ji nêzîk ve dişopîne û ji bo cezakirina kujeran û pêkanîna edaletê dozek gihandiye dadgeha giştî.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/rxistina-sara-doza-qetilkirina-3-jinan-disopne-h75113.html

Çavkanî:ANHA



## [Li Idlibê zarok dibin qurbaniya zewaca xizman]

Li Idlibê zewaca xizman zêde ye û gelek zarok astengdar tên dinyayê. Karmenda tendirustiyê Nûr El-Hemwî bal kişand ser girîngiya tehlîlên bijîşkî yên beriya zewacê.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/li-idlibe-zarok-dibin-qurbaniya-zewaca-bi-xizman-39385

Çavkanî:JINHA




**Kongra star**

**10/6/2023**